

HÊVIYÊN MIN
SIMAV EFRIN

**Îşev ....**
**Weke her şev tarî ye**
**Di tenêtiya xwe de**
**li qûncikên meyxaniya**
**êş û daxwazên bê**
**Meyê li hev dimalînin**
**Bê çav nêrînên xwe bi textêbenda te ve dadelaqînim**
**Ey laaawo....**
**Bê te ez koledara şevên**
**tarî dimînim**
**Nikarim xwe ji te**
**vegerînim**
**Û dûrî te ez xwe nabînim !!**
**Ditirsim di mija zivistanê de vegera**
**xwe nebînim**
**Û mîna FEQIYÊ TEYRAN binberf**
**bimînim**
**Û nikarim helbestên**
**xwe li ser lêvên te**
**binivîsînim**
**Ji ber vê yekê**
**Ez naçim**
**Her şev li maseyên sermestiyê li benda**
**te bimînim**
**Ger tu neyê xemla xwe li saqiyan**
**helal dibînim**

**Sîmav Efrîn**

**Kê netew parastî**

**Heger qunseliyek me heba**

**Yan biryardayîna perlemana bi destê me ba**

**Helbet ne ev halê netewa me ba**

**Di nav dewletan de cihekî me jî ê hebe**

**Ne tenê koçberî ê riya min û we ba**

**Bajarên kavilbûne ne yên warê me ba**

**Pengavên azadiyê ê malên me ba**

**Ejdar ne ê li zevî û zozanên me ba**

**Sirûda EY REQÎB bi yek destî ê sembola me ba**

**Ne tenê ala Kurdistanê ê li ser darebesta me ba**

**Li her çiyakî ê bimilmiliya dil pê şa ba**

**Sîmav Efrîn**

**Bi rêya Entirnêt**
**Gula diyarî hev dikin**
**Evîndarên penaber**
**
**Li welatê bin dest**
**Her roj çardehê reşmeh e !!**
**Xwîna şehîda**
**
**Ji sala borî de**
**Di guldankê de,çelmisîne**
**Gulên bajarekî vala**
**
**Bi sêvên sor**
**Li hev pîroz dikin cejnê**
**Kurdên şeyda**
**
**Li asîmana**
**Her roj cejna evînê ye**
**Leyl û dîn**
**
**Bajarekî kavilbûyî**
**Li xwe digirî !!**
**Gulfiroş**
**
**Bi gulên sor nerazîne !**
**Çi diyarî dixwazin ??**
**Xwendekarên zanîngeha**
**Gula nakire**
**Ji zeviyan didize**
**Şivanê gund**
**Çiyayê Sîpanê**
**Şilêrên sor dipişkuvîne**
**Xwîna du evîndara**
**Her roj kolan sor in**
**Qet ne cejn e !!**
**Bajarî ji bîr kirî**
**Sîmav Efrîn**

**Kirdistan im ez** Çawa tu dibêjî ??
Ez kurdê Îraq im !!!
Ez xelkê Suriyê me !!
Aaaaan jî kurdê Îran û Turkiyê me
Çeperast vegere
li dîroka xwe meyizeke û bigere
Ez kurd im
Kurdê Kurdistanê me
Li Başûr hebûna xwe dibînim
Darxistina rojene li Rojhilat im
Qêrîna dîwarên Amedê li
Bakur im
Gulzeytûn û goşgenimiya
Rojava me
Dîroka bav û kala me
Roka Zeredeşt li sema me
Pêt û agirê Kewa me
Ez ne Faris û Tirk im
Ne Ereb û dizê mirêşka me
Ji dema neolîtîk de ez şêrê
çiya me
Ez ne manedûna kesa me
Kurd im Kurdistan im
dilekî bi çar perça me
Ez ne girêdayî tu
welata me
Ji berî wan de ez welatekî
ser bixa me
Ez sorgula
Mezopotamiya me

**Berî cejnê**
**Bi pîrozî hev dipêcin**
**Sê roj**
**.....**
**Sê roja**
**Li ber xwe dide**
**Rojiyên Êzîdiya**
**......**
**Bi xemgînî**
**Pêşwaziya şemala şahiy dike**
**LALIŞ**
**....**
**Pîroz e**
**Bi navê xwe**
**Tawis Melek**
**.....**
**Pozbilin**
**Bi tîrêjên rokê xwe dixemlîne**
**LALIŞ**
**...**
**Bi giyanekî dîrokî**
**Pîrozkirî dibirûse**
**LALIŞ**
**....**
**Piştî koçiberiyê**
**Lêv dilerize**
**Cejnek sar**
**....**
**Bi şahî**
**Êş û birînan bi hev dixîne**
**Herçend vîn e**

....

**Berî birbangî**
**Ronî dike şeva tarî**
**Mûmên cejnê**

....

**Mûmên azadiyê**
**Bi rokê re pit pit dikin**
**Cejna Êzîd**

**#Sîmav EFRÎN #**



**ALA KURDISTANÊ**

**Xwe dixemilîn e**
**Bi bîst û yek tîrêjan**
**Ala Kurdistanê**
*******
**Asîmana dixwmlîn e**
**Ne bûka baranê**
**Ala Kurdistanê**
*******
**Bê ziman**
**Stêrkan dipeyvîne !**
**Ala rengîn**
*******
**Firindeyek azad**
**Bê bask li asîmana**
**Ala Kurdistanê**
*******
**Ji xwedê ve**
**Bi kivanî li asîmana !!**
**Ala rengîn**
**Bê nînok**
**Goşiyên stêrka dadiweşîne**
**Ala rengîn**
*******
**bedwebûna bejmê**
**Heyv tevlihev kir**
**Ala welatê rojê**
*******
**Hil de jor !!**
**Li ser giyanê pakrewana**
**Sembola serfirazî yê**
*******

**Dixemilîn e**
**Çiyayên Kurdistanê**
**Keske sor**
*******
**Bê sînor li asîmana**
**Gulistanek keske sor e**
**Ala welatê bin dest**
*******
**Ronahî dike**
**Şevên tarî**
**Ala Kurdistanê**
*******
**Şaxên zeytûnê**
**Na xemlîn e**
**Pîst û yek tîrêj !!**
*******
**Şîn ji zeytûnê**
**Sor ji xwînê**
**Ka ala Efrînê ??**
*******
**Li bana asîmana**
**Xwe dileqîne**
**Keskesor**
********
**Bê bask**
**Çar parên welat dimalîne**
**Ala welatê berxwedêr**

***

**Darebesta**
**pakrewana dimalîn e**
**Ala keskesor**
***

**Bê lêv**
**Heyvê radimûsîn e !!**
**Ala kurdistanê**
***

**Li ser ala rengîn**
**Hêviyan bi hev dixîne**
**Dapîra min**

**#Sîmav EFRÎN #**



Li nav êgir
Bê deng ratetin
Çirûskên Zeytûnî

Bi kefenê reş
Gupikên zeytûnê
Oxir kirin

Ta koçbûn
Bi cih nebûn !!
Zarokên Efrînê

Piştî
ev dem derbas bibe !!
Demek din ê me bigorin !??

Her tim
Ji kezebê parekî dibire
Dijminê koledar

Her kêliyekê
Li Efrînê vedigere !!
Helepce !!

Bi hêstirên xwînî
Zarok bi rê kirin
Dayêkên bext reş

**Piştî teqînê**
**Li zaroka digere**
**Lîstokên xwînî ! !**

**Bê xatir xwastin**
**Firîn asîmana**
**Zarokên bê welat**

**Temê li kurda**
**Diçirkîne diranan**
**Mirin !!**

**Ew hişyar ne kir !!**
**Ta maç û qêrînên bilind**
**Pakrewanên bi çûk**

**Li nav tiliyên dayîka**
**Bê rih dimilmil in**
**Firindeyên bê hêlûn !!**

**#Sîmav EFRÎN #**



**Lo baaavo !!!** **Pênûsa şevreş**

**Kê binirxînim ez ?**
**Ji kê bipirsim ez??**
**Çi binivisînim ez ?**
**Kê bişopînim ez ??**
**Hundir cîger û canê xwe**
**binirxînim ....!**
**Lê kûrahiya cîhanê di hestên xwe de bilerzînim ..!!!**
**Ê ku tu dixwazî .....!!**
**Pênûsa min nikare binivisîne .....!!**
**Durî sîng dil dîl û esîr e bê**
**cih û war dimîne**
**Lo baaavo.....!!!**
**Kê binirxînim ez ?**
**Ji kê bipirsim ez ??**
**Çi binivisînim ez ?**
**Kê bişopînim ez ?**
**Hîn koka Zeytûnê mîna**
**geliya bi xwîn e ...!**
**Biskên pakrwana xwe lê**
**dimalêne ......**
**Koçbûyî malên gunda sêrçe**
**bê ziman dilorîn in**
**Hêviyên pêk nehatî di**
**bixçika hestan de bi dardixînin .....!**
**Lo baaavo ....!!!**
**Kê bi nirxînim ez ?**
**Ji kê bipirsim ez ??**
**Çi binivisînim ez ?**
**Kê bişopînim ez ?? ....**
**Efrîn bû qamîşek hişk**

**li nav bajara ...!!!**
**Bû ew dara bê xa li keviya**
**kendala ...!!**
**Bajarakî zeytûnî bû agir pêxistin**
**Mizgefio mala ....!**
**Hên kor e pênûsê min li**
**xwe digirî wek bê hala !!**
**Wer bêje lo baaaaavo !!!!???**
**Çima cîwarên me ketin destê**
**neyara ......?????**
**Jiiiiiii kê bipirsim ez???**

**#Sîmav EFRÎN #**



**Ey dîlberê Îşev rabe ji xew**
**û xiyalên bê qîmetê ....**
**Tiştek ji destê min û te**
**dernetê**
**Mîna pelpelîskekê semake**
**li ser milê min**
**Ey dîlberê ...**
**were ......**
**Em bihev re bifirin ser**
**pêsîra heyvê**
**Bipispisin bê ku stêrk**
**me bibînin**
**Em hemî stêrkan bi dizî ji**
**ezmana birjînin**
**Bi ser bajarên xewkirî**
**de daşînin**
**Tiliyên te bi tiliyên xwe**
**re bimalînim**
**Divê ku berî şivaqê em**
**xwe berve jêr ve biherkînin**
**Mîna dergûşvanekî te di**
**hembêza xwe de bihejînim**
**Bila di pê va şevê re ez bimirim**
**û tu mirazan qet nebînim**
**Ey dilberê ......**
**dê were carekê ez te bibînim**

**Di nav valahiya tiliyan de**
**Kenî xwe belav dike**
**Wêneyek bê rih**

***

**Ji guldankên welat**
**Bi gurza gula diweşîne**
**Payîzek lêpikirî**

***

**Bi pîrhenekî spî**
**Çûn buhiştê**
**Perperîkên ciwan**

***

**Bask şikestî**
**Li ezmanekî digere**
**Çivîkên bê miraz**

***

**Di lepa zavan de**
**Hêştin xewnên xwe**
**Kevokên Qamişlo**

***

**Li ber dilopên**
**ciwanekî evîndar**
**Zivistan fedoke**

***

**Bê xilat**
**Hemî kurd vexwendarî kirin**
**Bûkên pakrewan**

***

**Di destên zêve de**
**Li nav welat digere**
**Hêviyên pêk nehatî**

***

**Ye bajarê evînê**
**Ma te têr ne xwar ?!**
**Ji destana Mem û Zînê**

***

**Va zivistanê**
**Baranek evîndar dibare**
**Hêstirên xortên Kurdistanê**

***

**Bê xemlandin**
**Çûn buhiştê**
**Biskên fereşfe yê**

**#SÎMAV EFRÎN #**



**Paytexta Evînê**

**Ê bimîne bajarê evînê**

**Xwişka Şengal û Efrînê**

**Ji bo te bê deng dinale Nisîbînê**

**Hemê kurd birînên te dibînê**

**Bi kesera dil diqirçînê**

**Silav dike li we kerkûk û Mêrdînê**

**Li Mahabet dijmin jinan bi dar dixînê**

**Kezba dayîkên kurd dişewtînê**

**Lê dîsa Qamişlo bajarê Mem û Zînê**

**Tu kember gulgenimî ji zeytûnê**

**Ermenistan dilsojî nameya te dixwenî**

**Rojava dimire cîhan çavan dadimrînê**

**#Sîmav EFRÎN#**

Bi qêrina kevir re
Hêza dijmin dişkîme
Zarokê kurd

Ta pêlîstokên zaroka
Walat diparêze
Kevir

Bê bask difire
Balafirên dijmin dişewtîne
Kevirên sêwî

Piştî şihadetê
Dinirxîne rêya dijmin
Sola pakrewana

Li welatê rojê
Sembola berxwedaniyê ye
Sol û kevir

Pakrewanin
Nakevin destê dijmin
Kevirên ROJAVA

Lek bi lek kom dibin
Bi ser dijmin dibarin
Sol û kevir

Serbilind
Gav bi gav dimeşin
Dayîkên kurd

**Li nav tiliyên zaroka**
**Raspêra Hevrînê pêk tê**
**Serhildana Rojava**

**Bê ziman**
**Li azadiyê digere**
**Kevirên welat**

Dixemlîn e
Serhilgirtina Rojava
Dayîka Hevrînê

Gorpana ceng
Kevir çekên qedexe dişewtîne
Dayîkên berxwedêr

Ji kevir û pêlavên dayîka
Wek roviyan direve
Dijmin

Li şûna perîşana
keviran hembêz dikin
Dayîkan pakrewana

Li hembêza dayîkan
Şibihet zeytûnê ye
Kevirên Cizîrê

Ji rûyê zordaran
Paqij paqijtire
Pêlav reş

**Ta bi kevir û pêlava**
**Diparêze axa xwe**
**Dayîkên şehîda**

**Bi keviran re**
**Hêviyên welat hilgirtî**
**Dayîka Pîroz**

**Li qada ceng**
**Bi hezar û sed bombane**
**Kevirên bê welat**

**Di destên dayîka de**
**Nîşana berxwedaniyê ye**
**Kevirên Rojava**

**#Sîmav Efrîn #**



**Şevek bê deng Îşev .....**
**Şevek ....**
**ne weke her şev bû ..!!**
**xewnekê ez girtim di**
**xewê de !!!!!**
**Pelên payîzê gulzeytûn**
**xwînê diherkînin pî de**
**Lehiyên xunava difetisin**
**dideştê de .....**
**Bi ferehbûna gerdûnê xewnek**
**kûr bû lê gelê min mirî tê de !!!!**
**Koçber bûm bê may**
**çûm bisewdê de**
**Hîn em dibînin**
**û min dît û dît dîîî...îît**
**Sunbilên canbiraştî evîna**
**xwe li şaxan diherkînin**
**hêstir tê de .......**
**Deştên hinarî , çiyayên gêlberûk**
**kavilbûne kes nema tê de**
**Di asoyên bê deng de pelan**
**dadiweşîne lê ne**
**di demê de**
**Bi tîrêjê berbangî re hişyar bûm**
**ne xewnek bû ku ez**
**tê de ......**
**Ew rastiyeke dijwar e gelê min**
**diçe bê de**
**Lê dêsa min dît ......**
**Solavên stêrkan ji ezmana têne xwer ......**
**PAKREWANÊN me tê de**

**Di lêvên rûnişteka de**
**Kêzik û Xiroke**
**Civîna xwe digerînin**
**........**
**Ji dengên xwe**
**direvin**
**Danoştekên sêwî**
**Li şûn şopên xwendekara**
**dîlana zordariyê**
**digere**
**.....**
**Li ser depa vala**
**Derazekî dinivîse**
**Calcalok**
**......**
**Piştî dagirkirinê**
**Dibistanên bajêr**
**Qada perwerda zirçepoza ye**
**......**
**Ta çivikên ezmama**
**Li ser nalorîn in**
**Rûniştekên ji hev ketî**
**........**
**Di bin xanî de**
**Pêlîstokên werzîşê dinal in**
**Dibistanên dagirkirî**
**..........**
**Dîroka sala borî**
**ditepîne**
**Pênûsa korcav**
**........**

**Li dibistanên vala**
**kerasê payîzê**
**Pêrtûka dileyzîne**
**........**
**Her sibe**
**Sirûda netewî dixwînin**
**Çivîk li şaxên xwe digirî**
**.......**
**Li dibistanê**
**Şehîd ket**
**Zarokê bê ling**
**........#Sîmav EFRÎN #**

**Payîz e evîna te Xwezî !!!!**
**Xweeeezî .....**
**evîna te mîna pelên**
**Payîz ba...!!**
**Di demsalekê de tu biweşiya !!!!!**
**û sê demsalan li min bigeriya !!!!**
**Bêtirî si salî ye**
**di tenêtiya xwe de dipirpitim !!!!**
**Li textê mirdar digevizim !!!!**
**Rûpelên dil hêdî......hêdî**
**diçelmisin!!!!**
**Giloverên çav pê te kûr**
**dimînin ......**
**Ji dengê xwe gul derevînim ......**
**Di şevên li ber xwe neketî de ....!!!**
**xeyalên te ditepînim !!!!**
**Di pozê helbestan de**
**bê deng te dinivisînim ...**
**Hemî zimana bi navê te dixemlîn im !!**
**Ji bilî dilê xwe , te li**
**hemî dilan dibînim**
**Bi hêstiran rûyê fedûk**
**diqelşînim !!!!**
**Çû payîz .....!!!**
**Hat Buhar .....!!!**
**Şev tariye ez te nabînim**
**Piskên demsala dûr porê te diqurçînim !!!!**
**Dûrî te mîna pela Payîzê**
**pê mey sermest**
**dimînim !!!!!**
**Saaaal derbas dibin .....**

**di durûçikiya evîna te de**
**li koka daran difetisim**

**#Sîmav Efrîn #**

**Di devê heyvê de**
**Sirûdek netewî ye**
**Mamosta dibistanê**
**بفم القمر**
**أنشودة وطنية**
**معلمة المدرسة**

**Li sre dîwarên dibisitanê**
**Hêstirek şewitî**
**Dayîka zirzêq e**
**على حائط المدرسة**
**دمعةٌ ثكلى**
**الام عاقرة**

**Bi nav gehayê hişk de**
**Xizêmokek dipişkive**
**Şagirta gund**
**بين عشب يابس**
**تنبت الاقحوانة**
**تلميذة القرية**

**Bi pozê tiliyan**
**serspiyan tev dide**
**Mamosta pergaldar**
**برؤوس أصابعها**
**تخربش رؤوس المقملة**
**معلمة انيقة**

**Bi dilê xwe dinivisîne**
**Deraza rojen e**
**Şagirtekî bê dest**
**بقلبه يكتب**
**الحكمة اليومية**
**تلميذٌ مبتور**

**Deriyên şikestî**
**Sobak êzingî**
**Dibistana ji birkirî**
**مكسورة الأبواب**
**تدفئة حطبية**
**مدرسة منسية**

**Bê hîpekirin**
**biazadî bihna xwe distîne**
**Dibistana gundê min**
**دون قيود**
**تتنفس بحرية**
**مدرسة القريتي**

**Li ser rûniştekên şikestî**
**xiştepişta**
**pelên Payîzê ye**
**فوق المقاعد المكسورة**
**تخشخش**
**أوراق الخريف**

**Di nav stêrkan de**
**çîvçîva heyvê ye**
**Mamoste**
**بين النجوم**
**تغرد القمر**
**المعلمة**

**Mil girane**
**Xurcek vala ye**
**yekem rojên xwendinê**
**مثقلة الأكتاف**
**محفظة فارغة**
**أول يوم دراسي**
**#Sîmav Efrin#**



**Evînî**

**Yên ji axê peyda bûne**
**Û kulîlka diweşînin**
**Ez û tu**
*******

**Du pêrtûkên evînî**
**Di pêrtûkxaneyê de**
**Ez û tu**
*******

**Ji nav dîwarên ji hev ketî**
**Du beybûn pişkivîn**
**Ez û tu**
*******

**Li ser şaxên zeytûnê**
**Du çivîk şehîd ketin**
**Ez û tu**
*******

**Li goristana**
**Du mirî can pê hatin**
**Ez û tu**
*******

**Li gorên şehîdan**
**Du gul neçelimisîne**
**Ez û tu**
*******

**Dastana evînê**
**Ne Mem û Zîn e**
**Ez û tu**
***

**Li çiyayê Sîpanê**
**Bi mitikî şehîd bûn**
**Ez û tu**
***

**Li ezmana stêrkên evînî**
**Ne Leyl û Dîn in**
**Ez û tu**
***

**Di guldanikê de**
**Du gulên li hev dimilmilin**
**Ez û tu**
***

**#Sîmav Efrîn#**



## KÎ ME EZ

**Ji gewriya dîrokê ez hatim**

**Cîgerê Hesinkar û**
**canpolat im**
**Aştîxwaz, azadî bi armanc**
**û xebat im**
**Xwişka Dicile, dengê Kitix**
**li Firat im**
**Hêviya Nisêbîn li welat im**

**Çavzeytûnî me li payîz ez**
**Sibat im**
**Destana evînê li keç û xortan**
**dihatim**
**Xakek pîroz bûm, lê hov bi ser**
**min de hatin**
**Bang kirin binavê Îlah û**
**Sewrat in**
**Ji bo me bikin winda, xwe bikin**
**îsbat in**
**Bê wijdan ser jêkirin lehtikên**
**ji lat in**
**Dagir dikin laş pîroz, tu deng ji**
**cîhanê nehatin**
**Lê najîm bi koletî dikim xebat im**

**Bi tena xwe berxwedanê dikim bi**
**sed welat im**
**Zeytûnî me pir bihêz û eynat im**

**Ji xwîna min kulîkan vegirtin**
**dîlan û dewat in**
**Gewriya mirinê bi hevokên kenok**
**dixemitîlim ez şihadet im**
**Nakevim kozika bindestiyê, aştîxwaz**
**û azad im**
**Eeeeez EFRÎN İM bi sed hezar**
**welaaaat im**
**Eeeeez EFRÎN İM bi sed hezar**
**welaaaaat im**
**#Sîmav Efrîn #**



## Biryarê nemir

Li bihuştê sema dike
Tev zarokên Anfala
Bilbilekî bi çûk

Di nirînên çavan de
Li miletê bin dest
Tabiloya yekîtiyê xelat dik

Bi xwe re
Biskek ji porê bûkê
Ji bav re bir

Bê zarokên kurd
Dojah dibe
Bihûşt

Li ser rêçûna bav
Xwe qurban kir
Pakrewanê bi çûk

Di gora dil de
Du evîna ditewîne
Hevjîna pakirewan

Roj bi roj pelan diweşîne
Mîna payizê ye
Kurdistan

**Du gulên Zagros**
**Xelata pakrewaniyê**
**Li şaxên zeytûnê dikin**

**Bi lorîna dixemilîn e**
**Geyanê Biryar**
**Dayîka kurd**

**Ji mirinê natirsin**
**Jiyanek bi rûmet dixwazin**
**Bav û kur**

**Li pêsîra Zagros**
**Du çivîk bûn stêrk**
**Bav û Biryarê nemir**

**Li ser ala Kurdistanê**
**Malbeta xwe qurban kir**
**Dayîka aştîxwaz**

**Bi rondikên çav**
**Kefenê zarokê xwe dirût**
**Dayîka Biryar**

**Berî ku can bide**
**Bi lêvên xwe maçek**
**Ji ala Kurdistanê stand**

**#SÎMAV EFRÎN#**

**من زرقة عينيها**
**تمزقت الفصول**
**السماء خجلى**
**Ji şînbûna çavan**
**demsal perçiqîne**
**Ezman fedok e**
*
**من زرقة عينيها**
**يعرفها الجميع**
**طفلة شنكال**
**Ji şînbûna çavan**
**Her kes wê nas dike**
**Zaroka Şengalê**
*
**من زرقة عينيها**
**نام السّماء**
**فوق المجازر**
**Ji şînbûna çavan**
**Ezmên li ser**
**komkujiyan xew kir**
*
**من زرقة عينيها**
**ينزل الدمع**
**راقصاً لا تشكو!!**
**Ji şînbûna çavan**
**Rondik diherike**
**Sema dike gazinan nake !!**

*

بزرقة عينيها
صنعت أرجوحة
ميديا
Bi şînbûna çavan
Wê hêlana Mîdiya
afirand

*

بزرقة عينيها
علمت الإنسانية
دروس منسية
Bi şînbûna çavan
Wê mirovahî fêrî
Waneyine jibîrkirî kir

*

بزرقة عينيها
ترسل السلام
للقبور الجماعية
Bi şînbûna çavan
Silavan li
gorên komî dike

*

من زرقة عينيها
ينزل حروف
أين الشاعر ؟؟؟
Ji şînbûna çavan
tîp dibaran
Kanî helbestvan ???

*

بزرقة عينيها
تبتسم على صمت الجدار

**لوحات الاضحية !!!**
**Bi şînbûna çavan**
**li ser bêdengiya dîwar rûken dibe**
**Tabiloyên qurbaniyan !!!**

*

**بزرقة عينيها**
**كتبت .....**
**ملحمة دموية**
**Bi şînbûna çavan**
**dastaneke xwînî**
**Nivîsand .....**

*

**زرقة عينيها**
**تذكرنا**
**بأرض عشتار**
**Şînbûna çavan**
**Erdê Eştar**
**Tîne bîranîna me**

*

**بزرقة عينيها**
**تتجمع مجازر**
**شنكال**
**Di şînbûna çavan de**
**Komkujiyên Şengalê**
**Kom dibin**

*

**من زرقة عينيها**
**تمزقت الجنان**
**الوجوه خجلى**
**Ji şînbûna çavan**
**Bihuşt çiriyan**

**Rû fedok e**

*

**من زرقة عينيها**

**أرجوحة خرزيه تتدلى**

**طفلة الأنفال**

**Ji şînbûna çavan**

**Hêlana morikî nazdar dibe**

**Zaroka Anfalê**

*

**بزرقة عينيها**

**تهمس بآذان سماء**

**أين القضية ؟**

**Bi şînbûna çavan**

**Di guhên ezmên de pispis dike**

**Kanî doz ???**

**#SÎMAV EFRÎN#**



**SİBA TE BİXÊR BEYBÛNA MİN**

**Siba te bixêr zeytûna min**

**Gulbihara zivistana min**

**Çawa dikim tu narî ji bîra min**

**Bi bîranîna te diperpite dilê min**

**Wek çema Kitix dixulxule xwîna min**

**Siba te bixêr Zeytûna min**

**Dimilmile wêneya te li ber çavên min**

**Tu heyvî lê windayî ji şeva min**

**Te dibirin û sînor danîn pêşa min**

**Barekî giran li ser milê min**

**Siba te bixêr Zeytûna min**

**Bê te jiyan derbas nabe yara min**

**Bûka buharê li demsalên min**

**bê te sêwiye welatê min**

**Li tiliyên sibê tû yî Elenda min Siba te bixê Zeytûna min**

**Bi çavên zeytûnî**
**Sîngê genimî**
**Bi şewat dilorîne**
**Welatê rojê**

**Bi fîstanekî reş**
**Xwe dixemlîn e**
**Bûka evînê Qamişlo**

**Bi alafên duşvaniyê**
**Li zeviyan Şehîd bûn**
**Perperîkên evînda**

**Di nînika çavên te de**
**Bajarê xwe dibînim**
**Ji ber ku zeytûnî ne**

**Qêrîna gulgenimiya**
**li zeviyan , gulhenaran**
**dipşkuvîne**

**Çar demsala**
**Nîşan dide**
**Percbûna welatê kurda**

Di gewriya birbangî de
Çivîk û kevok dinalin
Hevcarê çotyara xewkirîne
🦋🦋🦋

Pîzêrkên xerîbiyê
Can dişewtîne
Qêrîna zeviya pixçika
hesta diçirîne
🦋🦋🦋

Geştiyên cotkara
Li ber derayên mezin
rawestîne
🦋🦋🦋

Yek bi yek
Xwe şewitand
Guleyên genimî
🦋🦋🦋

#SÎMAV EFRÎN#



**Enî ne da enî**
**Koka hêviya anî**
**Welatfiroş**

**###**

**Laş helbesta**
**dewlemend kir**
**Guleyên genimî**

**###**

**Li her helbestekê**
**Xwe xulmakole kir**
**Gûşiyên genimî**

**###**

**Kilçikên şewitî**
**Zeviyên komirî**
**Asoyên cotkara**

**###**

**Li şûna peyalên bênderevan**
**Bê geyan gore mane**
**Telîzên pîne kirî**

**###**

**Ne şewata zevî û dexlane**
**Cenga hest û ramanane**

###

**Ewrên avis ji ezmana**
**baran ne barandin**
**Ji hulma zeviya fetisyan**

###

**#SÎMAV EFRÎN#**



**Çiya û daristanên ku**
**dişewitin ez im**
**A di helbesta lêdanê de**
**maye ez im**
**Zemîna xêzik lê diçêre**
**ez im**
**Li bêderan tê bazarkirin**
**ez im**
**Bi şûrê Ereba tê serjêkirin**
**ez im**
**Dûr ji rojê ser bidûman**
**maye ez im**
**Gulsosina bê bihar maye**
**ez im**
**Miriyên bi ax nebûne**
**ez im**
**Qêrîna bêdeng maye**
**ez im**
**Dewlemend ji derd û kul**
**ez im**
**Şagirtê bê mamoste**
**ez im**
**Zanîngeha bê xwendekar**
**ez im**
**Pênûsa bê zaniyar ma ye**
**ez im**
**A li textê stemkaran dida-**
**liqe ez im**
**Tarûmar û winda dibe**
**ez im**
**Şêrê li devê roviya maye**

**ez im**
**A şehîd bûye û nemirî**
**ez im**
**A li destê xwînmêjan maye**
**ez im**
**Sirûda bejina lewend**
**ez im**
**A bûye çîrok û sitran**
**ez im**
**Kurdino a li we silav dike**
**ez im**
**#SÎMAV EFRÎN#**

**Lêstûkên sêwî**

**Çirên me temirandin**

**Gupikên me qurçandin**

**Hêviyên me çelimisandin**

**Lêstûkên zaroka şewitan**

**Kerasê azadiyê helandin**

**Şev li rojê qulibandin ……**

**Gerdûn çep werqerandin**

**Li pînika hêk çeliqamdin**

**Kanî ji xwînê herikandin**

**Bi zinçêra em pêçandin**

**Ji daran pel weşandin**

**Perîşan bi ava miriya**
**kelandin**
**Ji kerên me hespên xwe**
**afirandin**
**Kes ji me li war venege -**
**randin**

**#SÎMAV EFRÎN**

**Bûka bi çûk**

**Ji bîra min nare çavên
kilkirî
Sorgul ji xwînê dixulxilî
Çember kirin rêçûna me
bi kevirî
Nalîn û qîrîn xistin va
delî
Çima bûka Kurdistanê ket
devê wa gurî
Dev bixwîne dest qirêj e
laş gemirî
Taca spî li serê bûkan
diçirî
Hêstirên dayîka li rû
qemirî
Kolanên me dişewitînin,
kirin laşekî komirî
Lê bihuşt nabe çirûska
temirî
Eger em dest bidin dest
bi yek birî
Kes nikare me ji hev
bibirî
Ji bîr nekin lêvên kesk û
sor xemilî
Hîn em zarokên Mîtan
û Arî
Bi destên xwe rakin ji mil
vê barî
Vegerînin taca bûka piçûk**

**bila nemîne rêşkirî**

**Bes e her bûkeke me diçe**
**bixwînê dixemilî**

**#SÎMAV EFRÎN#**
**1/5/2019**



## Sembola çiya

Pêt û agirê te
Ji xwîna şehîdên me
Bihar xweş e bi navê te
Gupik gul dibe li dilê me
Newroza min
Sembola min
HêsinKar dîrok azad kir
bi navê te
Hager tuştek nema
agirê te ji bejna me
Wek Mezlom xemilandî
cejna te
Keç û xot te zarok fedane
ji bo te
Newroza min
Sembola min
Bihar xweş ne li me
Her tim xwîn dibe
birîna me
Ji kenê Şehîdan li ser
dekê dilorînin
dayîkên me
Newroza min
Sembola min
#SÎMAV EFRÎNÊ #

**Namek bi şewat Ne helbest……!!!!**
**Tenê qêrîn û nalîn ☹**
**Helepce….Helepce…..**
**Min ji bo te Tu helbest diyar nekirin**
**Ne ku min tu ji bîr kiriye**
**An jî cihê êş te di dilê min de tu ne ye**
**Heya niha pihna cihra kîmawî tê ye min**
**Her sala ji komkujiya te min şaxên Efrînê dihûna**
**Li ber çavên sîstema çavsor min rê girê dide**
**Lê hîne destên min ji xwîna Efrînê şilin ☹**
**Laş birînim rih mirim ….**
**(KURDÊN BAŞÛR)**
**Diniya ewqs li serê me ne fereye**
**Çar perçe KURDISITANÊ di dilê me de ye**
**Ne tenê di helbestên me de ye**
**Sedhezar helbest di dest û hestên me de ye**
**Ji bo tevahî Kurdên cîhanê**
**Bihar ji bo me kurda pir bi êşe**
**Silav û hurmet**
**#SÎMAV EFRÎNÊ #**

**17/3/2019**

Qamişloo--------Tu evîna her kurdekî ye
Tu xwerevîna her dilekî ye
Ev roj nayê ji bîrkirin
Çavê her dayîkekê bi hêstira
hat kilkirin
Dazdehê Adarê bi xwîna zarokên
te hate nivîsandin
Kefenekî ji xwînê li miriyên
me pêcandin
Bi azadî li ser mil me şehîdên
xwe li kolanên te gerandin
Civîk û bibil ji li ezmanê
te dixwendin
Bêbextî her tim dijmin
em dixûpandin
Destên me ji hev diqetandin
Lê nizanî ku kurda evîna
xwe bi dilekî çandin
Û can ji bo hev feda ú
sînor bi evînê dirandin
Ji navê te Qamişlo Kurdistan
tê xemilandin
Tev Efrînê birîna te tê ye meyandin
Qamişloka min ji durahiya te
xerîbîyê ez helandim

**Tu helbestî Her rojek ji bû te**
**cejn e can ê**
**Tu pîrozî bi Tewrat**
**û Quranê**
**Tu şanazîbira welatê**
**min î**
**Tu vîn , evîn û vejîna**
**Jiya nê**
**Heger dayîke xebatkare**
**tê xuyanê**
**Tu yî şervanek paqij wek**
**cilpikên baranê**
**Tu pêşengî , tu malbetî**
**tu baş dizanê**
**Welat bi te ava dibe**
**ez qurbanê**
**Tu xemrevîn û bihûşta**
**Kurdistanê**
**Ji kenê te kulîlk dipişkivin**
**li zozanê**
**Xweşrenge bejna te**
**li dîlanê**
**Bi fîtanê kurmacikî**
**dîrok xuya dike li cihanê**
**Maqam bilindî mîna**
**çiyayê cûdî tu**
**sembola berxwedanê**
**Ji reşikên çavên te**
**hêviyên me nûjen dibin**
**bêrîvan ê**
**Sondixwin tê bimîne**


# çirûskeka azadiyê
# li çar berçe Kurdistanê

**#SÎMAV EFRÎNÊ #**



**Tu bû yî ....**
**ew gûz a li nav pelan**
**nayê xuyan!!!!**
**Ma ez ê serdarekê**
**ji ku hunim**
**Di serê te da dînim**
**Ku te li bin darê bibînim 😄**

**#SÎMAV EFRÎN#**
**22/2/2019**



**Te çi nas kir loo**

**Dema te got ji te hez dikim**
**mam bê deng ....**
**Te çi ji bêdengiya min nas kir lo ???**

**Tu bû heyv, şev bê tariye**
**Ji tariya şevê te çi nas kir lo???**

**Qêrînek bê deng bûm ,**
**ziman pûç û lalbû**
**Bêje te çi nas kir lo**

**Dema name nîvqircî bê**
**peyv tê ber çavên te**
**Ka bêje te çi nas kir lo??**

**Dema ku biguleyên evîna xwe tu derbasî çepa sîngê min bû yî......!!!**
**Bêje te çi nas kir lo????**

**Dema te gora min bimilêbên destên xwe**
**Kûr kir**
**Bêje te çi nas kir lo???**

**Li mirinê min got ji te hez nakim !!!!**
**Kaaaa bêje te çi ji gotina**
**min nas kir looo????**
**Kaaaa bêje te çi nas kir looooooo??????**

**#SÎMAV EFRÎNÊ #**
**5/2/2019**

## Bi êş derbas bû

Xelkê peyalên xwe
dagirtin !!!
Lê ez serxuş bûm ......!!!
Bişahî şeva tarî
derbas kirin
Bi desmalên evînî
Xudana xwe paqij kirin

**Lê av dilaşê me de**
**sar kirin**
**Xemgînî li tembûra**
**me saz kirin**
**Darên xwe ronîkirin .......**
**Darên me ji binda**
**hilkirin**
**Bi her kenekî rih ji**
**laş dibirin**
**Sala bûrî bûka me bê**
**tac kirin**
**Bi xaînetî zave şehîd**
**kirin**
**Lê sala nû nizam yên**
**me çi bikin**
**Ji bo Kurda şahî**
**yasaxkirin**
**Darên me ji xwînên**
**Şehîdan xwe pîroz kirin**

**Zarokên biçûk li bin**
**şaxên zeytûna**
**qurban kirin**

**La .................**
**Kurdino çma em ji hev**
**bidûr kirin......?????????? 1/1/2019**

**Birîna me yeke**

**Birîna Koban ê û**
**Efrînê yekê**
**Tu carî kes nikare me**
**ji hev bi dûr bixe**
**Ji berxwedniya serdemê**
**re dîroka kela DimDimê**
**dibareke**

**Bi serfirazî Serê Kaniyê**
**hembêza xwe veke**

**Dilê neyara li me şa nek**

**Ji dayîkên çav şil re**
**sîngê xwe bibaxçeke**

**Qamişloka min heya ku**
**Efrîn bihna xwe distîne**
**evîna xwe ji bîr neke**

**Tenê evîna xwe bi Kurdan**
**re parveke**

**Axa cîhanê xwîna pakrewanan**
**me dimêje yek bi yeke**

**Zarok sêwî ketin**
**ev çi feleke**

**Dûjeha dûrahiya welat**
**penxaziyo ji bîr neke**

**Ji hest û ramanên xwe**
**dûrahiya welat çeke**

**Şiqinên zeytûna ji**
**mêrantiya te**
**berdewam dike**

**Dayîka şal spî ji hêzên çavên**
**te aram dike**

**#Sîmav EFRÎNÊ #**
**23 /12/2018**



**Diyarî we dikim**
**hevalnooo**

**Ez kulîlk bûm .....**
**Ez perperîkek bûm......**
**Te ez kirim pelek**
**ji pelên payîzê....!!**
**Li goçeyên xerîbiyê**
**xeyaaaaalên......**
**Xeyaaaaalên ........**
**te**
**bi hestên min dilîzê**
**Te ez dînkirim ....!!!!**
**Looooo laaaawo**

**#SÎMAV EFRÎNÊ #**

**Piçek ji te hez kir**

**Bi navê xwedê li ezmana**
**Min gelek hej te nekir**
**Tenê min piçekî hej te kir**
**Ew heskirina min ji bo te**
**Ji hindiktirînê bi hindiktir bû**
**Lê ew hindiktirîna ji**
**mezinahiya cihan mezintir bû**
**Ji dilê xwedê feretir bû**
**Te ew evîn piçek bû**
**Ma evîna te çiqas bú**
**Loooo lawo**
**#SÎMAV EFRÎNÊ #**

أحببتك قليلاً
بأسم الله في السموات
لم أحبك كثيراً ......!!
بل أحببتك قليلاً ..... !!
ذلك حب كان لك
كان أقل من القليل القليل .......
ولكن ذاك القليل
كان أكبر من كبر الأرض 😲
وأوسع من قلب الإله....... !!!
كان ذاك الحب .... أقلُ من القليل
ولكن .......
كم كان حبك أيها الفتى ؟؟؟؟!!!!؟؟؟؟؟
#SÎMAV EFRÎNÊ #



**Dîroka me**

**Dîroka Kurda kevnar e**
**Lê li ser bilind kirin duwar e**
**Li durê kûmê bûn**
**tofan û mar e !!**
**Kurdo bese te kir zirar e....**
**Bese bindestî peneberî li me bar e**
**Bese te xwe kir devê mar e !!!!**
**Bese em şêrin ,çima rovî bo mar e???**
**Dest bike yek rabe weke**
**Kewayê hêsin kar e**
**Bese te xwe kir devê heftar e ....**
**Bese zarok çav şil stî xar e 😟**
**Rabe kuuurdo dîroka me kevnar e**
**Bipirse dîroka xwe ji çiye,**
**şikeft û zinar e**
**Evîna Kurdistanê li dilê me germe**
**tu carî nabe sar e**
**#SÎMAV EFRÎNÊ #**
**Spasdariya mamoste حسن ایوب dikim ji bo nexşya Kurdistanê dîrokî**



**Dergûşa welat**

**Bi dilekî kuştî ....**
**Dergûşek hêştî!!!**
**Bê dil xwazî ....**
**Penaberbûm**
**Penaberbûm**
**Nirînên çav bi girî**
**Rih di laş de mirî ....**
**Zeytûna li pê me dagirî**
**Penaberbûm**
**Penaberbûm**
**Ziman zinçî kirin bi zurî...**
**Koletî berdan ser va milî ! !**
**Koçber kirim bi zorî ....**
**Penaberbûm**
**Penaberbûm**
**Bû şêr ew rovî !!!!!**
**Ji bîkir çawa direvî !! ....**
**Bû tûfan li kabên me gerî ...**
**Ji nûva Penaberbûm**
**Penaberbûm**
**Gulên porê min li sênoran bihûrî**
**Çi bêbextî hat va serî ???**
**Xerîbî na be welat tu çarî**
**Hêdî ....hêdî jiyana derbas dibe bi dijwarî**
**#SÎMAV EFRÎNÊ #**

## KÊ GOT EZ EFRIN iM

**Ez sitrana Xelîl Xemgînim**
**Mirovahiya dengê Bangîn im**
**Ez qurmî zeytûna ji şurê Derwîşê**
**Evdî bi xwînim**
**Kê got ez Efrîn im**

**Ez mêrantiya Salan li çiya bi xwîna**
**Ciwama diherkînim**
**Evîna Memê Alan di dilê her**
**keçekê de xwe dibînim**
**Ez dayîka çav şil ya Mêrsînim**
**Azadiya zîndana DiyarBeki li**
**Qendîlê diçêrînim**
**Kê got ez Efrîn im**

**Ji birîna Sin e û Kirmaşan**
**birîna xwe bîrvetînim**
**Serî dayîkên pekirewanan bi renigê**
**kevoka dixemilênim**
**Ez bi çûkim lê dil ji bo her**
**kurdekî mezin dibînim**
**Kê got ez Efrîn im**

**Ez bûm çêrokek bi şewat li her derekê**
**xwe bi hesret dibînim**
**Ji mirinê rih dikişînim**
**Dêrokek serfiraz ji kurda re bi**
**tenê zeytûna dinivîsînim**
**Ez tenê ne Efrîn im**
**ez dilê Kurdistana şêrînim**

**#SÎMAV EFRÎN#**



## BESE

**Weke patozekê evîna te**
**diçine dilê min**
**Kurpe. .... kurpa..... wê tê**
**gulên min**
**Weke germa havînê dihelîne**
**kezeba min**
**Şev tarî bû ye Ji awirên**
**çavên te li min**
**Carekê tu nêz û carakê**
**dur ji min**
**Hêdî beseeee tu lîst bi**
**hestên min**
**Beseeee dil dişewite te**
**ne xema min**
**Bese tu pir zalimî weke**
**qedera min**

**#SÎMAV EFRÎN #**



Xwaziya ez jinek weke
hin jinan bama
Daxwazên min cil û bergbana
Hêviyên min zarok û kulîlk bana
Xwaziya ez jinek weke
hin jinan bama
Dilê xwe bi birîna çar perçan
neşewitanda
Erdnîngariya Kurdistanê bi
sînorê reş ne xwenda
Navê pakirewanan bi milyonan
. nenivîsanda
Pênûs bi Peyva azadiyê ne
helanda
Bila her hestekî azadiyê di
mêjî de bi çewsanda
Xwazî li va diniyayê ez ne
hatibama
Xwaziya ez jinek weke hin
jinan bama ma ........

#SÎMAVEFRÎN #

**Ez û tu**

**Ez û tu .......**
**Qederek bi şewatin !!**
**Ez û tu ....**
**Di xeyalên şaş de rastî**
**hev hatin**
**Ez û tu ......**
**Koçber in bê welatin!!!**
**Ez û tu.....**
**Awazekî bêdeng hatin 🎻 🎻**
**Ez û tu ....**
**Weke rûpelekên pizirî ji**
**pirtûka hil hatin**
**Ez û tu ......**
**Ji Kelimên sirînganê konirek**
**bi şewatin**
**Ez û te ......**
**Li mirinê di gorakê hilnehatin**
**Ez û te ..........**
**Ez û te .........**

**Mirin.....li dora min digere....!!!!**
**Ne Min dibe!!!!!**
**û ne jî ji min digere.....!!!**
**Weke kesekî evîndara . ....**
**Ne yar dibe.....**
**û ne jî jê digere ......**
**يدور الموت حولي. ....**
**لا ياخذني ! !!!!!!!**
**ولا يتخلى عني !!!!**
**مثل شخصآ عاشق ....**
**لا يأخذ حبيبته .....**
**ولا يتخلى عنها !!!!!!!!!**

**#SÎMAV EFRÎN #**

****AZADÎ ****

**Piş deriyekî pizirî……**
**Dil dipirpitî…….**
**Di çûkahî de derî li min**
**hate girtin! !!!!!**
**Bi dûr xistim ji azadiyê…**
**Rama kuştin û**
**mêjî vala hêştin**
**Tenê di sînora hundir de mam**
**Tirs time li min bû mîvan**
**Para dil azadî biba xwidan**
**Lê beseeee ez mezin bûm …**
**Ji mêjiyên girtî hişyar bûm …..**
**Bi destên xwe derî li rêya xwe vekir !!!**
**Azadiya xwe bi welat re ban kir …..**
**Bi navê Kurdistan ala xwe rakir ……**

**#SÎMAV EFRÎN #**

**Hevala min**
**Hevala min Tu çarî tu bi**
**tenê ne ma ye**
**Çav şile hêstirên te**
**li ser kaba min ma ye**
**Ji te bi dur ketim**
**ês li şuna min ma ye**
**Zanim tu weke bajarê min birîn daer**
**lê tu Sêwî ne ma ye**
**Bi çûk de jiyana te**
**zehmete û winda ye!!!!**
**Evîn li te heram kirin**
**tu kesî rê ne daye**
**Evînek reş tu dorpêc kir**
**ma ne bi destê xweda ye**
**Hestên te bilindin e birîna**
**te ne xiya ye**
**Kenê te bilinde xemgîn e**
**mîna dilê Kurda şewitya ye**
**Ji tîrêja çavên te li**
**ezmana rojê bihna xwiyê da ye**
**Çi binivisînim pênûsa min**
**li hember kulên te mat maye**
**Her tiştekî bi êş ji serê xwe çeke**
**li ba min tu pir buha ye**
**Çiqas şev tarîbe tu**
**hêvî ya dilê keça ye** **#SÎMAV EFRÎN #**
**3/9/2018**

**Ji destên te dayîka min**

**Bi biraştina nanê li ser**
**sêla te tîrêjê rojê hildihat**
**Bihna genimê şamî ta**
**zeviyên duzelikê dihat**
**Şivan dil geşdibûn ken li**
**rûyê wan dihat**
**Li dura te komdibûn xizmên**
**me bê xilat**
**Roj derbas dibû bi**
**henek û xebat**
**Daaaaaayîka min**
**Ji dûrahiya te dimirim ....**
**lê sîng ne tirbeye**
**Goçeyên xeribîyê be**
**evîne ken lê tune ye**
**Dayîka min çav bi hêstir in**
**te hajê tune ye**
**Durî hembêza te ciher**
**Xêr lê tune ye**
**Hêdî...... hêdî. .... dişewitim**
**Kesî weke te tune ye**
**Cîhan mezine lê cihê**
**Kurda lê tune ye**

**#SÎMAV EFRÎN ##**

**Rêyek bê dawî**

**Bi qêrînek bê deng**
**Dilekî kuştî ....**
**Çavên şilavî**
**Koçber bûm.....**
**Ji welatekî agir pê ketî**
**Ji bajarekî ketî destê talan û dizî**
**Dîrok li berê rizî !!!**
**Bihar çû li kulîlkan ne pirsî**
**Zarok man Sêwî! .....**
**Zeytûn çav Bi hêstirên xwînî**
**Lê Koçber bûm.....!!!!**
**Li rêyek bê dawî ...**
**Xwînên pekrewanan li geliyan**
**bi me ra dikenî**
**Dilê dayîka ji birînan dikelî**
**Lê min li wan birînan ne dagirî !!!!**
**Êş û şewata xwe bîr anî**
**Dema ku rastî bira kurdên**
**xwe hatim**
**Giriyê min li wan hatin**
**Kurde li nikarî bi min re biaxifî**
**Lal ma tenê li çavên min nirî**
**Neyara zimanê wî dizî**
**Kurdo şerime zimanê te kanî**
**Çima li ser lêvên te pizirî..???**
**Tu bû yî malek tune ser xanî !!!!!!**
**Kurdo kanî zimamê Ehmedê xanî ??????? #SÎMAV EFRÎN ##**

